hêjatiyên şêwe maf û daxwazên rewya yê gelê Kurdistanê û dîrok û bihayên bilind ên civaka Kurdistanê bide naskirin û rê bi evîniya niştiman û hişyariya giştî ya di civakê de bide. Destxweşiyê li we dikim û pêzanînen min ji bo erk û keda we heyê.

Mesûd Barzanî
KDP.info

17.01.2019

PDK û YNK: Em hewl didin ku bilez hikûmeta nû bê avakirin

Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) û Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê (YNK) li Hewlêrê civiyan û piştî civîna ragihandin ku ew hewl didin

Seidî Ehmed Pîre kongreyeke roj-namevanî lidar xistin.

Berdevkê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) Mehmûd

were yekalîkirin û demê diyarkirî ji avakirina hikûmetê re bê diyarkirin."

Mihemed herwiha got: "Me ji herdu aliyan lijnayê din jî pêk anî, ew lijnayê taybet e bi çekirina jihevtegihiştina zêdetir di navbera YNK û PDKê de di çarçoveya rêkeftinê de, daku ji niha û şûnde em bi hev re li gel aliyan din hikumraniya vî welatî bikin û bi pêkvebûnê em bêhtir xizmeta gelê Kurdistanê bikin." Mehmûd Mihemed wiha got: "Me bi zelafî behsa wê yekê kir ku divê em bilez û bi awayekî cidîr kar bikin û hewl bidin ji bo avakirina hikûmeta nû."

Ji aliyê xwe ve, Berdevkê YNKê Seidî Pîre ragihand: "Pirsgerêkên di navbera PDK û YNKê de ne ewqasî mezînin bûn. Divê PDK û YNK di nav xwe de lihevkerîneke siyasî çêbikin, ji ber ku dema ew yekdest bin, Kurdistan qezencê dike. Pêngava me ya yekê avakirina hikûmeta nû ya Kurdistanê ye, ku hikûmeteke bihêz be. Ew hewl didin ku ew hikûmet bilez ava bibe û bilez pirsgerêka Kerkûkê jî



ku bilez hikûmeta nû ya Herêma Kurdistanê ava bikin.

Îro PDK û YNK di asteke bilind de civiyan û piştî civîna berdevkên herdu partiyan Mehmûd Mihemed û

Mihemed ragihand: "Me tekezî li ser wê yekê kir ku lijnaya danûstandinê ya PDK û YNKê çalakîr be û dest bi karên xwe bike da ku mijara pêkanîna hikûmetê û kabîneya nû zûtir

Îranê heyeta YNKê bi PDKê da qebûl kirin

PDK û YNK ji bo pêkanîna kabîneya nû ya hikumeta herêma Kurdistanê roja 14.01.2019ê li Hewlêrê civiyan.

Her du şande, ne her du mekteb siyasî kombûne, di medyayê de nûçe hatin weşandin ku her du mekteb siyasîyên PDKê û YNKê kombûne, lê di rastya xwe de şanda YNKê ne şandeya mekteb siyasî bû, ji nivê zêdetir ne endamên mekteba siyasîya YNKê bûn.

Piştî civîna berdevkên her du aliyan daxuya kirin ku civîna wan civînek serketî bû çend mijarên giring tê da hatine gotûbêj kirin û li ser çend xalan li hev kiriye. Lê di rastya xwe de ew civîna bê encam bi dumahîk hatiye. Xala li ser li hev kirin bi tenê pêkanîna dû komiteyan ku pêkve li ser pêkanîna hikûmetê kar bikin.

Li gor zanyariyên gehîştîne malpera me, partî ya nerazî bû ji pêkhatiyê şandeya YNKê ku ji nîva şandeyê zêdetir ne endamên mekteb siyasîya YNKê bûn û her jiber vê egerê jî çend caran civîna hatibû paşxistin:

YNKê di nava xwe de nekarî heyetek ya mekteba siyasî pêkbîne, ji ber ku Bavi û Lahur jî di xwestin di nav şandeyê de cih bigirin û her dû jî ne endamên mekteb siyasî ne.

PDKê nedixwest Lahur û Bavi Talabani di nav şandeya YNKê da hebin, li gor PDKê Bavi û Lahur cîbecîkarên xiyana 16 Oktubera sala 2017ê ne û bi xiyane û tawanbarin.

Gelo çi çêbû? Ev her dû xal çawa hatin çareser kirin? Çawa YNKê şandeya xwe bi wê pêkhatiyê pêkîna û

çawa PDKê pêşwazî li wê şandeya YNKê kir û di gel kom bû?

Li gor zanyariyên gihane malpera me, Îranê dest di çareserkirina wê arîşeyê da hebû. Wezîrê derve yê Îranê daxwaz ji YNKê kir ku lazîme Bavi Talebanî û Lahur Şêx



Cengî di nav şandeya YNKê de hebin. Ji ber ku ew dostên Îranê ne û ecendayên Îranî li başûrê Kurdistanê cîbecî dikin.

Partî jî ji ber gev û dibin gûvaştinên Îranê de neçar bû pêşwaziyê li şandeya YNKê ya bi wî awayî bike û qebûl bike di gel bicive. Partî ne dixwest di dema serdana Mihemed Cewad Zerif wezîrê derve yê Îran bo hewlêrê arîşe çê bibin û bibe egera nehatina wezîrê derve yê Îranê.


Partî mecbûr bu bi wî awayê pêşwaziyê li şandeya YNKê bike daku serdana wezîrê derve yê Îranê arîşe û bi serkeftî derbas bibe.

rojevokurd.com

Fransa: Emê berdewam bin li ser alîkarî û piştevaniya Pêşmerge û Kurdistanê

Şewirmendê Encûmena Asayaşa Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî û Wezîrê Derve yê Fransayê Jean-

û navçê hatin guftûgokirin û tekezî li girîngîpêdana pêwendiyên dostane û dîrokî yên di navbera gelê



Yves Le Drian îro danê sibê civiyan û di wê civînê de Deian got: "Emê berdewam bin li ser alîkarî û piştevaniya Pêşmerge û Kurdistanê."

Di hevdîtîna de, Balyozê Fransa li Iraqê û Konsolê Giştî yê Fransa li Hewlêrê û hejmarek ji dîplomatarên wî welatî amade bûn.

Di vê hevdîtîna de dawî pêşhat û guhartinên Herêma Kurdistanê, Iraq

Fransa û Kurdistanê di warên cude de hate kirin. Di destpêkê de Mesrûr Barzanî spasî li gel û hikûmeta Firansa û hewlên Serok Emmanuel Macron ji bo piştevanî û hevkarîya bi Herêma Kurdistanê kir, ji ber ku Fransa di tevahiya qonaxan de hevkar û piştevana mezin a xebata gelê Kurdistanê bûye.

Şewirmendê Encûmena Asayaşa

Herêma Kurdistanê girêdayî bi prosêya siyasî ya Iraqê ve, ronî xiste ser pêşveçûnên di navbera Herêma Kurdistanê û Bexdayê de û amaje bi wê kir ku bi berçavgiirtina destûra Iraqê hewl bo nehîştina pirsgrêkan werin dayîn.

Her di wê hevdîtîna de derbarê eger û mercên rewşa Sûriyê de, tekezî li girîngiya aramkirina aloziyan û çareserkirina siyasî ya pirsgrêkên wî welatî hate kirin, ku mafên hemû pêkhateyan lixwe bigire.

Ji aliyê xwe ve, Wezîrê Derve yê Fransayê Jean-Yves Le Drian hêviya serkeftinê ji Mesrûr Barzanî di serokatîkirina kabîneya nû ya hikûmeta dahatî ya Herêma Kurdistanê de xwast û ronî xiste ser şewazê ferehkirina pêwendiyên di navbera her du aliyên de û ragihand, pêwendiyên di navbera welatê wî û Herêma Kurdistanê de dîrokî û girîng in. Herwiha xweşaliya xwe ji qonaxa nû ya pêwendiyên Hewlêrê û Bexdayê nîşan da û dupat kir, welatê wî di piştevanî û hevkarîya Herêma Kurdistanê û Pêşmerge de berdewam dibe.

Zêbarî: Şîe di bin fişara Îranê de kar bo derkirina hêzên Amerîkî dikin

Endamê Polîtîburoya Partiya Demokrat a Kurdistanê û Wezîrê Darayî yê Iraqê yê berê Hoşyar Zêbarî derbarê daxwaza Şîeyên Iraqê bo derkirina hêzên Amerîkî welatê xwe



ragihand, "Daxwaza serkirdeyên Şîe ya derkirina hêzên Amerîkî ji Iraqê li ser guvaşa Îranê ye." Hoşyar Zêbarî li Twittera xwe nivîsî: "Serkirdeyên Iraqê bi cidî û di bin fişara Îranê de kar dikin ku li Parlemantoya Iraqê deng li ser derkirina hêzên Amerîkî ji Iraqê bidin." Ev daxuyaniya Zêbarî di demekê de ye, Parlemanterê Hevpermaniya Bîna Mensûr Biêcî duhî gotibû, proseyasaya derkirina hêzên biyanî ji nava xaka Iraqê tê amadekirin û ji bo Serokatîya Parlemantoyê tê pêşkêşkirin, ji bo di zûtîrîn dem de dikeve karnameya Parlemantoyê û deng li ser were dayîn. Mensûr Biêcî got jî, piraniya hêzên siyasî dê deng bidin vê proseyasayê, ji ber ku ew nîşana serweriya Iraqê dide.

kurdistan24.net

Pisporê Fransî Gerard Chaliand serdana mezarê nemiran kir

Şareza û pisporê Fransî yê navdar Gerard Chaliand li devera Barzan serdana mezarê Barzaniyê

Îro Şemiyê 19.1.2019 Gerard Chaliand serdana mezarê nemiran kir û ji aliyê Xelat Barzanî Nûnerê



Nemir û Îdrîs Barzanî kir û li wir got ku Barzaniyê Nemir 50 salî xebat û têkoşîn kiriye ji bo ku gelê wî bi azadî bijî.

Serok Barzanî û komîteya pêşwaziyê ve hat pêşwazîkirin.

Gerard Chaliand taceke gulên li ser mezarê nemiran danî û behsa

xebat û têkoşîna Barzaniyê Nemir kir û got ku Barzanî 50 salî xebat û têkoşîn kiriye ji bo ku gelê wî bi azadî bijî.

Gerard Chaliand, pispor e di warê şer û cengên cihanî de û di dema Şerê Kendavê de Neteweyên Yekbûyî daxwaz jê kir ku raporekê li ser rewşa Kurdan binivîsîne.

Gerard Chaliand wê demê pirtûka xwe ya (Trajediya Kurdî) nivîsand û tê de behsa dîrok û êş û azarên Kurdan li herçar perçeyên Kurdistanê dîke.

Gerard Chaliand herwiha pirtûkeke wî bi navê (Miletê bê dewlet. Kurd û Kurdistan) heye û tê de nivîskar behsa tevgera neteweyî ya Kurdî dîke û behsa mafên rewa yên Kurd jî bo azadî û serxwebûnê dîke. Herwiha bi şirove û lêkolînê behsa rewşa Kurden herçar perçeyên Kurdistanê dîke. KDP.info

Tirkmen daxwaza çend payeyên bilind di kabîneya nû ya hikûmetê de dikin!

Serokê Partiya Geşepêdana Tirkmen aşkera kir ku ew partiyên tirkmenî yên kursiyên parlamentoya Kurdistanê bidest xistine, dê bi yek paketê ve beşdarî guftûgoyên pêkanî-



na hikûmetê bikin û daxwaza çend payeyên bilind bikin. Serokê Partiya Geşepêdana Tirkmen Mihemed Îlxanî ji malpera fermî ya PDKê re ragehand, pêkhateya tirkmen daxwaza payeya cigirê duyem ê serokê hikûmetê, yan jî cigirê serokê parlamentoyê li gel wezaretekê û destyeyekî dîkin. Ji ber "Di kabîneya borî de tenê yek wezîr ji me bû, naha jî ji ber wek pêkhateya netewî tirkmen duyem netewa Kurdistanê ne, em daxwaz dîkin di payeyên serokatîyê de jî beşdar bibin." Îlxanî aşkera kir ku piştî PDK li gel YNK û Gorran guftûgoyan de zelalî pêkanî, dê serdana pêkhateyan jî bike û ew partiyên tirkmen ên kursiya parlamentoyê bidest anîne, li gel yek dê li gel şandeya PDKê bicivin û daxwazên xwe pêşkeş bikin.

BasNews

Erîşa li ser rojnemevanê kur li Rusya yê

Rojnamevanê kurd ji başûrê Kurdistanê yê Kurdistan 24ê Xoşevî

Malbata Xoşevî Mihemed, di daxuyanyekê da daxwazî ji serok



Mihemed, li Mosko ya patyexta Rûsyayê rastî êrîşekê hat. Çend roje li nexweşxaneyê Butkîn li Mosko yê dihête çareser kirin û rewşa wî ne başe. Li gor zanyariyên malpera me, çend kesan Xoşevî biriyê nav daristanekê û bo mîrnê lédane heta jê bêhêvî bûn û laşê wî li wê daristanê hêlayîne. Rojnamevan Xoşevî bi awayekî profesyonel karê xwe yê rojnamevaniyê dikir û çend caran raste rast pirs li ser mesela kurdî ji Vlademir Putîn serokê Rûsyayê kirîne.

Barzanî, Nêçîrvan Barzanî, Mesrûr Barzanî û mekteb siyasîya PDKê dîke ku encamderên wê tawanê bihêne eşkerekirin û bigehin sizayên xwe.

Di medya Rusî de ev çend roje li ser hev di derbarê êrîşa ser rojnamevanê kurd Xoşevî Mihemed gelek zanyarî tîn belav kirin. Lê medya başûrî bi giştî û Kurdistan24 bi taybetî xwe li vê pîrsê nekiriye xudan weku pêwîst be çewaniya çêbûna bûyerê û tawanbarên wê ji raya giştîra nehatiye eşkere kirin.

Li gor hindêk çavkaniyên, nûner-

atiya Hikumeta Kurdistanê li Moskoyê, PKK ev kiryar kiriye û PKK tê tawanbar kirin. Lê ev îdia heta niha nehatine piştrastkirin.

Nûnerê PDKê li Rûsya, Xoşevî Babakir, êrîşa ser rojnemevanê kurd şermezar dîke û daxwaz ji Yekîtiya Rojnamevanên Kurdistanê û nûnerên çapemeniya Rûsyayê dîke ku li hember vê tawanê dengê xwe blind bikin û şermezar bikin.

Divê hemû rojnemevanên kurd û



biyanî dengê xwe li hember vê êrîşê blind bikin. Ji ber Xoşevî di nav rojnamevanên biyanî bi teybet Rûsî jî yê naskirî bu. Lê pîrsa gelek balkêş eve: Gelo çima kanala Kurdistan 24 li ser vê tawanê bê denge weke pêwîst li rojnamevanê xwe xwedî dernakeve? rojvakurd.com

Sezgîn Tanrikulu: Bêyî dengên kurdan CHP li Stenbolê bi ser nakeve

Parlementerê kurd yê CHPê dibêje, bêyî dengên kurdan CHP nikare li Stenbolê li hember AKPê bi ser bikeve. Par-



lementerê kurd yê CHPê Sezgin Tanrikulu ji malpera tirkî ya K24 re behsa hîlbijartinên şaredariyan yên Tirkiyê kiriye û gotiye, rast e CHP bi HDPê re ti tifaq nekiriye lê ew du partî dê gelekî hevkarîya hev bikin. Sezgin Tanrikulu daye zanîn, CHP bêyî dengên kurdan nikare li Stenbolê li hember AKPê bi ser bikeve, ji ber wê jî divê CHPê gelekî hişyar be. Wî parlementerê kurd yê CHPê rexne li partiya xwe jî girtiye û gotiye, eger em di rewşa niha ya Tirkiyê de, ku gelekî kambax û şepirze ye, nekarin desthilatê bixin destê xwe, xetayê me ye ne yê dengêderan. CHP di hîlbijartinên şaredariyan de bi Partiya Îyî, ku ji MHPê veqetiyaye, tifaq kiriye.

BasNews

Kambaxiya ku hatiye serê Rojavayê Kurdistanê, ji destê PYDê ye

Siyasetmedarekî Kurd ji Rojavayê Kurdistanê dibêje, ew kambaxiya ku hatiye serê gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê, hemû ji destê PYDê ye. Siyasetmedarê Rojava û serokê berê yê opozîsyona Sûriyê, Ebdulbasit Seyda ji malpera KDP.info re ragihand: "Rewşa Rojavayê Kurdistanê gelekî kambax û tengav e ji ber ku roj bi roj gef û tehdîd li ser wî beşê Kurdistanê zêdetir dibe."



Ebdulbasit Seyda her wiha dibêje, ji ber wê jî pêwîstiya Rojavayê Kurdistanê bi alîkarî û piştevanîyê heye, vêca çî li derve yan jî li hundir. Lê PYD li hember her gavekê astengiyên çêdike ji ber ku bi serê xwe gavan davêje û guh nade ti kesî. Seyda wiha got: "PYD amade ye bi her kesî re kar bike tenê bi kurdan re na. Ev jî bûye sebeb ku metirsek mezî li ser doza kurd li Sûriyê çêbibe. Loma kambaxiya ku hatiye serê gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê, hemû ji destê PYDê ye. Serok Barzanî li Hewlêr û Duhokê çend caran hewl da ku Kurdên Rojava bike yek, lê PYD bû rêgir ji wê yekîtiyê re. Eger ew rêkeftinên Hewlêr û Duhokê çêbibe bibana, dê rewş niha ne ev ba." Bi nêrîna wî siyasetmedarê Rojava, siyaseta PYDê îflas kiriye lê dîsa jî dersan jê wernagire û li ser xeletiyên xwe îsrar dike.

rojvakurd.com

Grêya hikumeta Swêd vebû nexşe li ya Kurdistanê jî

Piştî 131 roj bi ser hilbjartnan ra derbas bûn, partiye siyasî li Swêd, karî li hev bikin û hikumeta Swêdê pêkbinin û serokwezîrekî destnîşan bikin. Roja 18.01.2019ê parlamentoya Swêdê deng bi Stefan Loven serokê partiya Sosyaldemokrat da û ew weku serokwezîr rеспart ku hikumeta Swêdê ava bike, tê çaverêkirin ku roja duşemê 21 vê mehê Stefan Loven pêkhatiya kabîneya xwe pêşkeşî parlamentoyê bike daku baweriyê pê bidin.



Li Swêd du blok yan dû bere yê klasîk hene ku di hemû hilbjartinan da li ser kursiyên parlamentoyê hevîrîkê dikin; Bloka li jêr navê (Alyans) ku ji 4 partiyan pêk dihê ewjî; Partiya Modêrat, Center Partî, Partiya Lîberal û Partiya Kîrist Demokrat. Herwesa blokê din jî li jêr navê (Kesk û Sor) ku pêk di hêt ji Partiya Sosyal Demokrat, Partiya Çep û Partiya Jîngehê. Di van salên dawiyê da Partiya Regezperest ya bi navê (Demokratên Swêd) hatiye ava kirin û hilbjartin bo hilbjartinê rewşa wê ber bi başiyê diçe û dengên wê zêde dibin, di hilbjartina dawiyê da 62 kursî bidest xistin û bo partiya sêyem li Swêd. Helbjartinên Swêd li roja 2018/9/9 hatine encam dan û blokê (Sor û Kesk) bi yêk kursî jî blokê (Alyans) zêdetir deng înan û vê yekê jî wesa kir ku avakirina hikumetê gelek bi zehmet be û ji ber hindê jî gelek giro bû.

Ji bona ku Partiya Regezperest (Demokratên Swêd) nekeve di hikumetê da û ji bona ku wê çî bandor û desthilat li ser hikumetê nebe, dû partiye nava blokê Alyans, Partiya Center û Partiya Liberal piştevanîya Stevan Loven kir û di dengdanê da deng li dijî Loven neda, dengên wan bi dengê zer hatin hesab kirin, anku bêdeng. Partiya Çep jî bêdeng man û dengên wê jî zer hatin hijmartin.

Dengan bi vî awayî bû:

Erê: 116 deng (Sosyal Demokrat û Partiya Jîngeh)

Nexêr: 153 deng (Moderat, Krist Demokrat û Sveriga Demokrat)

Dengên zer: 77 deng (Partiya Center, Liberal û Partiya Çep)

Yasaya Swêd bi vî awayî ye: Parlamentoya Swêd 349 parlamentêrîn, diviyabû 176 kesên gotiba nexêr hîngê Stefan Loven nedikarî bibe serokwezîr. Vêca bila partiye başûrê Kurdistanê jî sazane (kompromîs) biken û berjewendiyên gel bi ser hemû berjewendiyan ra danin û lezê li pêkanîna hikumetê bikin û dest bi xizmeta xelkê bkin.

rojvakurd.com

Îran piştevanîyê li başûrê Kurdistanê dike


Nêçîrvan Barzanî Serokwezîrê Herêma Kurdistanê, roja 15.01.2019ê li bajarê Hewlêrê, digel Mihemed Cewad Zerîf Wezîrê Derve yê Komara Îslamiya Îranê û şandeya pê re civiya.

Di civînê de, têkeliyên navbera Herêma Kurdistan, Îraq û Îranê û giringiya berdewamiya wan têkeliyan û hevahengî û hevkarîya navbera Îraq û Herêma Kurdistanê digel Îranê ji bona rûbirûbûn û biyekcarî nehêlana terorê, hatin gotûbêj kirin û her du alî hev hizir bûn ku hêsta metirsiya terorê heye û ji bona nehêlana wê divê hemû alî bi hev re hevkar û hevaheng bin.

Nêçîrvan Barzanî sipasiya Îranê kir ku di dema şerê dijî DAÎŞê da hevkarîya Herêma Kurdistanê kir û tekîd li ser giringiya hevkarî û hevahengiya welatên herêmî ji bona rûbirûbûna terorê û nehêlana wê, kir.

Cewad Zerîf piştevanîya welatê xwe ji bo pêşveçûna têkeliyên

geşkirina têkeliyên di warê aborî, bazirganî, kultûrî, çandinî, zanistî û



Hewlêr û Bexdayê nîşan da û hevî xwest ku hemû pirsgerkêna xwe bi diyalogê çareser bikin. Çewaniya

di warên din da û nixandina rewşa herêmî bi giştî, çend mijarên din yên civînê bûn. rojevakurd.com

"Ey reqîb her maye qewmê kurdziman"

Bi minasebeta bîranîna 73 yemîn sala 2yê rêbendana 1324an (22yê kanûna paşî ya sala 1946an) ez dixwazim hem ji bo yadkirina roja damezirandina Komara Kurdistanê û hem jî careke din birêz yadkirina şehîd Ebdurrehman

Huseyîn Seyfî Qazî

3) Wezîrê Kar û Barên Hundurî: Mihemmed Emînê Mu'înî

4) Wezîrê Tendirustiyê: Mihemmedî Eyyûbiyan

5) Wezîrê Muşawêriyê: 'Ebdurrehmanê Îlxanîzade



Qasimlo, kurtîyeke bi Kurmancî ji kitêba wî ya "Çil Sal Xebat Di Rêya Azadîyê de" pêşkeşî xwendevanên Rûpela Nû bikim.

Wê demê şert û mercên hundurî û derve, ji bo ragihandina Komara Kurdistanê bi temamî amade bû, ji ber vê jî roja 2yê rêbendana sala 1324 (22yê kanûna paşî ya sala 1946ê)an, li Meydana Çarçirayê ya li bajarê Mahabadê di civîneke fireh û mezîn de, ku nûnerên ji gelek ciyên Kurdistanê tê de beşdar bûn, damezirandina Komara Kurdistanê hat îlan kirin û Qazî Mihemmed ê rêberê Partiya Demokrat a Kurdistanê bû Serokkomarê Kurdistanê. Di wê civîna mezîn de, Pêşewa Qazî axivîtiye û programa dahatî ya kar û têkoşîna Komara Kurdistanê daye xuyakirin, ev di bîngeh de ew program bû ku Partiya Demokrat çêkiribû û qebûl kiribû.

Piştî re di bin serokatîya Hacî Babe Şex de bi 13 wezîrên din re kabîneya wezîran hat damezrandin, ku piraniya wan nûnerên sinif û tebeqeyên navîn ên xelkê Mahabadê yan axa û xwediyê milkên mezîn bûn. Navê wezîran di rojnameya Kurdistanê ya hejmar 22yê rêbendanê de hatiye weşandin, ku ev kesên han bûn:

1) Serokwezîr: Hacî Babe Şex

2) Wezîrê Şer: Mihemmed

6) Wezîrê Rê û Banan: Sîmaîlê Îlxanîzade

7) Wezîrê Aboriyê: Ehmedê Îlxanî

8) Wezîrê Poste û Telgrafê: Kerîmê Ehmedeyî

9) Wezîrê Bazirganiyê: Mustafa Dawûdî

10) Wezîrê Kulturê: Menafî Kerîmî

11) Wezîrê Zîraetê: Mehmûdê Welîzade

12) Wezîrê Teblîxatê: Siddîq Heyderî

13) Wezîrê Kar: Xelîlê Xusrewî(1)

Karekî sembolîk ku cara yekê di roja 26ê sermawezê (17yê kanûna pêşî ya sala 1945ê z.) de rû da û di roja 2yê rêbendanê (22yê kanûna paşî ya sala 1946ê z.) de li Mahabadê resmîyet qazanc kir û piştî re li bajar û gundên din ên Kurdistanê hat carî kirin, kêşana alaya Kurdistanê bû. Alaya Kurdistanê sê reng bû: rengê sor li jorê, spî li navendê û kesk jî li xwarê bû. Armeya Komara Kurdistanê di nivê alayê de bû û ji qelemekî di navbera du ûşiyên (simbilên) genim pêkhatîbû. Qelem, sembola qîmetpêdana Partiya Demokrat û Komara Kurdistanê bi kultur û zanistiyê bû û ûşiyên genim jî nîşana berhem û kar bû. Roj jî li jora armeyê bû û ew jî sembola azadîyê bû. Piştî

2yê rêbendanê ya hilkêşana alayê li navçeyên Kurdistanê, ji bo rakêşana gelê Kurdistanê nav sefên Partiya Demokrat û Komara Kurdistanê, bangeke ragihandinî ya gelek fireh û mezîn hate kirin. Ev bû ku, bû bebeb li hemî bajaran û her wiha li gundên mezîn ên wan navçeyên Komara Kurdistanê tê de bi cih bûbû, merasimên kêşana alaya Kurdistanê pêk hatin. Rêvebirên Partiya Demokrat, ku ji Mahabadê diçûn, bi xelkê re diaxiftin û siyaseta Partiya Demokrat û Komara Kurdistanê ji wan re şirove dikirin û daxwaza piştvanîyê li wan dikirin(2).

Piştî damezirandina Komara Kurdistanê, sirûdeke resmî jî ji partiye û komarê re hat hilbjartin. Ew, eynî ew sirûda bi nav û deng "Ey Reqîb" e, ku niha jî sirûda Kurdistanê ya resmî ye. Hilbjartina vî sirûdê tesadûfî nebû. Em dikarin bêjin ku piştî çend sed salan gelê kurd karîbû fermanrewaya neteweyê xwe dabimezrîne û desthilata wê bigre destê xwe. Ji ber vî, pêwîst bû, her wekî ew sirûd dibêje, bihatiya gotin:

"Ey reqîb her maye qewmê kurdziman,

Kes nebêje kurd miriye, kurd zindiye".

Piştî bi sedan sal, 2yê rêbendanê nîşana wê bû, ku dijminên neteweyê kurd nekarîbû vî neteweyî jî holê rake. Bi ser hemî wan zulm û zordariyên bê sînora ku di dirêjahiya dirêkê de li gelê kurd hatîbû kirin, lê cardin dijminên neteweyê kurd gelek caran di vî mebesta xwe de bi serneketin û nekarîna kurdan biqelînin an bihelînin. Ji ber vî, gelek girîng û sembolek bû ku hewar bê kirin û bê gotin: "Neteweyê kurd her maye, neteweyê kurd her zindî ye".

(1) Di hinek ciyan de navê Mele Huseyîn Mecîd jî wekî wezîrê dadperweriyê derbas bûye. -Nivîskar.


(2) Roja 6ê rêbendanê bajarê Mahabadê cejneke mezîn li dar xist û damezirandina Komara Kurdistanê pîroz kir. -Nivîskar.

Ziya Avci

rupelanu.com

Serokwezîrê Iraqê soz da: Emê pirsgrîkên di navbera Hewlêr û Bexdayê de çareser bikin

Di hevdîtina di navbera Serokwezîrê Iraqê Adil Ebdulmehdî û Cîgirê Serokê Parlamentoya dayê de ye. Dr. Beşîr Hedad û Dr. Adil Ebdulmehdî behsa pirojeyasaya



Iraqê Dr. Beşîr Hedad de, Adil Ebdulmehdî ragihand ku karê wan ê herî li pêşî çareserkirina pirsgrîkên di navbera Hewlêr û Bex-

manberên Herêma Kurdistanê û Pêşmerge di budceyê de bê cîbicîkirin û mafê Pêşmerge û fermanberên Kurdistanê ji nakokiyên siyasî bidûr bin.

Dr. Beşîr Hedad û Adil Ebdulmehdî tekez kirin ku ew kursiyên ku ji Kurdan hatine sitendin di hikûmetên berê yên Iraqê, dibê ji wan re vegezin. Herwiha derbarê rewşa Şingalê jî tekezî li ser wê yekê hat kirin pêwsît e Hikûmeta Iraqê piştgrîyê bike li wê deselata ku bi hilbijartinan hatiye danîn.

Dr. Beşîr Hedad daxwaz ji Dr. Adil Ebdulmehdî kir ku hewlên cidî bide ji bo çareserkirina kêşe û pirsgrîkên di navbera Hewlêr û Bexdayê de.

Serokwezîrê Iraqê jî bi temamî soz da ku hemû hewlên xwe bide ji bo çareserkirina pirsgrîkên di navbera Herêma Kurdistanê û Bexdayê û ragihand ku karê hikûmetê yê herî pêşî çareserkirina wan pirsgrîkan e.

KDP.info

Girêkên li pêş projeya Tirkîyê ya "Herêma bi ewle"

Rojnameya "aawsat" çapa Londonî hûrgilî û astengiyên li pêş avakirina herêma bi ewle li Rojavayê Kurdistan û bakurê Sûriyê ji aliyê Tirkîyê ve belav dike.

Serokê Amerîka Donald Trump ku berî çend rojan gotibû, ewê herêmeke bi ewle bi kûrahiya 20 Miles (dora 32 K.M) li bakurê Sûriyê ava bikin.

Serokomarê Tirkîyê Recep Teyip Erdogan ragihand, ew bi awayekî erênî pêşwaziya pêşniyara Trump a dirustkirina herêmeke bi ewle dikin û heger Hevpeyman alîkarî bin, Tirkîyê bi xwe dikare herêma ewle ava bike û nabe YPG li herêma ewle hebe.

Rêveberiya Xweser, MSD, TEVDEM, PYD, YPG û HSD jî dibêjin, ew ne li dijî avakirina herêma bi ewle ne, lê bi mercê ku ev herêm ne ji aliyê Tirkîyê ve bêne parastin.

Rojnameya "aawsat" çapa Londonî di raporta xwe de belav kir, Tirkîyê dixwaze mercên xwe li ser herêma bi ewle bisepîne, di heman demê de Kurd, Rûsya û Amerîkî bi Enqerê re li ser 6 xalan lihev nakin.

Yekem: Kûrahiya herêma Ewle, Enqere dixwaze ew herêma bi ewle 32 K.M be, Washingtonê bi awayekî destpêkî li ser 10 K.M razî bûye. Mosko pêşniyaz dike di navbera 5 – 10 K.M be. Lê Fermandarê Giştî yê Yekîneyên Parastina Gel (YPG) tekez dike ku divê ev herêm li aliyê din ê sînora di hundirê Tirkîyê de be.

Duyem: Parastina herêma û

bavê wê, Tirkîyê dixwaze bi "Herêma bi Ewle" binav bike, anku dijefirînê. Mosk dixwaze "Herêma Tampo" û bê dijefirînê be. Kurd dixwazin "Herêma Dijefirînê" be, ta ku ji Tirkîyê bêne parastin.

Erdogan jî wê hişyariya Bolton red kir. Enqere dibêje, YPG ne nûnerê Kurdan e. Lê Mosko hewl dide berjewendiya her du aliyan bicih bîne.

Pêncem: Rêveberiya herêma bi



Sêyem: Hebûna dewleta Sûrî, Enqere red dike ku ti hebûneke Sûrî li wê herêmê hebe. Mosko pêşniyaza belavbûna hêzên Sûrî li ser sînora di çarçova serweriya Sûriyê de dike.

Çarem: Kurd, di 23ê Beçileyê 2018an de Serokê Amerîka pêwendî bi Serokomarê Tirkîyê Recep Teyip Erdogan re kir û daxwaza gerentiya parastina Kurdan kir. Herwiha Şewirmendê Asayîşa Netewî ya Amerîka John Bolton jî Tirkîyê ji êrîşa li ser Kurdan hişyar kir, ku

ewle, Enqere pêşniyaz dike encûmenên xwecihî bêne avakirin û kesên pêwendiya wan bi YPGê re nîn in tê de bicih bibin. Mosko li ser avakirina encûmenên xwecihî razî ye. Lê YPG dibêje, berê encûmenên hilbijartî hene. Şeşem: Pêwendiya herêmê bi hikûmeta navendî re, Enqere dixwaze ev herêm dîrî desthilata dewletê ya rasterast be. Mosko rîjê e ku ev herêm vegere bin desthilata hikûmeta Sûriyê. YPG jî mikurhatina li Rêveberiya Xweser daxwaz dike.

kurdistan24.net

Bi wêne...Hêzeke Amerîkayê dikeve nav biryargehekê Iraqê



Hêzeke Amerîkayê dikeve nav biryargehekê artêşa Iraqê ya li bakurê paytext Bexdayê.

Îro 19.01.2019ê çapemeniya Iraqê belav kir, ku hêzeke Amerîkayê ya ji hêza bejayî ya deryawaniya Amerîkayê (Marenz) pêkhatiye ketiye biryargehekê Iraqê. Herwaha diyar kirin ku hêza marenz bi çekên giran çûye nav biryargeha Bêcî ya parêzgeha Sela-hedînê ya li bakurê Bexdayê.

Çûna wê hêza Amerîkî ya ji bo biryargeha Bêcî, di demekê de ye ku fraksiyon û parlamentêrên partî û aliyên şîeyên Iraqê, li parlamentoya Iraqê hewl didin proje yasayekê amade bikin bo derxistina hêzên Amerîkayê ji Iraqê.

BasNews

Serxweşiyek ji Dr Fuad Hussein Cîgirê Serok Wezîr û Wezîrê Darayî ya Iraqa Federal

Birêz cenabê Serok Barzanî Mekteba Siyasiya Partiya Demokrata Kurdistanê Bi xem û kovaneke mezin nûçeya koça dawî ya kesayetiye xebatgêr û navdarê Kurdistanê û Endamê berê yê Mekteba Siyasiya Partiya Demokrata Kurdistanê Mamosta Mihemed Mela Qadir gihîşt me.



Xwedê jêrazî kesayetiyeke şoreşgêr û Pêşmergeyê dêrîn û serkirdeyê diyarê tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurdistanê bû û her ji destpêka xort lawitiya xwe ve peywendiyê bi şoreşa Eylulê kiriye û berdewam bûye li xebat û têkoşînê de û roleke ber bi çav di dema şoreş û xebat û koçberiyê de hebûye û li çendîn warê hizbî û siyasî û Pêşmergeyatiyê da kar û xebatê kiriye. Piştî rizgarkirina Kurdistanê û damezrandina yekem kabîneya Hikûmeta Herêma Kurdistanê wekî Wezîr kar kiriye û herdem li xebat da berdewam bûye. Ji destdana vî kesayetiye şoreşgêr li karwana xebata gelê Kurdistanê de ziyaneke mezine. Bi vî helkefta xemgîn de pîrse û serxweşiyên xwe pêşkêşî we yên birêz û malbat û kesukar û hevalên xwedê jêrazî dikin û ji xwedayê mezin hêvîdarîna sebir û aramiyê bide hemû aliyek û cihê xwedê jêrazî bihûştî fireh bê. Inna Lilleh We Inne lleyhî Racîun (Em Ji Xweda Hatîm û Emê Dîsa Vegerin Xweda) Fuad Hussein Cîgirê Serok Wezîrê Iraqa Federal yê Karubarê Aborî û Wezîrê Darayî ya Iraqa Federal.

kdp.info

Qursên zimanê Kurdî dest pê kir

Qursên zimanê Kurdî îro li Enqerê, di navenda Wakfa Riya Azadî da dest pê kir. Qasî 20 kes hatibûn. Beşekî wan jî bo fêrbûna ziman teze dest pê dikin, beşek jî Kurdî dizanin, dixwazin pêşva bibin.

Bona vî yekê ewê wek du grûb dersê bibinin. Herdu grûb jî wê roja şemiyê dersê bistînin. Qurs di saet 11.00 da dest pê dike, heya saet 16 û niv berdewam dike.

Mamosteya wan Zerî Xanimê îro dersa pêşî da. Ew li ser elfîba Kurdî bû. Rûdaw TV jî îro hazir bû û ew çalaki wek nûçe hazir kir û şand.

dengekurdistan.nu

Xortekî Efrînê kuştî hat dîtin

Li Bajarê Efrînê yê Rojavayê Kurdistanê girtin, revandin, eşkenekirin û kuştina Kurdan, ji aliyê çekdarên ser bi Tirkîyê ve, berdewam e.




Rêxistina Mafên Mirovan li Efrînê belav kir, bavê du zarokan Egîd Mihemed Şêx Hesên yê 24 salî ku ji gundê Evrazê yê navçeya Mabata ye, roja 15ê vî mehê termê wî li nav darên zeytûnê li kêlek çemê Ziravkê kuştî hat dîtin.

Li gor zanyariyên wê rêxistinê, dawî car Mihemed Şêx Hesên hatibû dîtin, berî mirina wî bi 3 rojan bû, ku bi otombîla xwe çû Dadgeha Leşkerî ta hebûna xwe biçespîne, ji ber ku biryarek derbarê wî de hebû û divê her demekê ew xwe li wê dadgehê bimîne.

Ji dema dagîrkirina Efrînê ji aliyê artêşa Tirkîyê û grûpên çekdar ve, ev çandî car in welatiyên Efrînê ji aliyê grûpên çekdar ve tîr revandin û termê wan li ser rê û li nava zeviyên zeytûnan kuştî tîr dîtin

kurdistan24.net

Avabûna Komara Kurdistanê ya Mehabadê Şoreşeke Siyasî Milî Ye...



İbrahim Guçlu

Li Îranê di dawiya sala 1945an de neteweya azerî serhilda û bajarê Tebrîzê xiste bin kontrola xwe. Di 11yê meha 1945an de Komara Otonom a Azerbeycanê ava bû. Kurdan jî hem bi xurtî piştgiya wan kirin û hem jî Kurdistan azad kirin.

Pêşewa Qazî Mihemed jî, di 22. 01. 1946an de li meydana Çarçirayê damezirandina Komara Kurdistanê ragehand. Di dema ragehandina damezirandina Komara Kurdistanê ya Mehabadê de, Qazî Mihemed di axavtina xwe de wusa digot:

"Kurdistan xwedî ciyekî stratejî û erdnîgariya (cografyeya) taybet e ku gelê kurd her tim û bi bê wê hindê ku netewe û miletekî din di navbera wan de mesafe çêbike û wan ji hev biqetîne, tev bi hev re tede dijîn û tede xwedî malikiyeta xwe ya millî ne. Ser bihurî û dîroka wan ya derbasbûyî yek e û bi giştî tede hevpar in. Kurd, xwedî edeb û edet û nerîtên netewî yên wisa ne ku bi ti rengan, sedemên cûr bi cûr û ti bûyereke nekariye sistiyek di nava bingeh û binaxê mileta wan de peyda bike.

Qazî Mihemed, li ser navê PDKa Îranê û wek serokê giştî yê Komara Kurdistanê di axavtina xwe de damezirandina partiyê jî îlan kir. Pişt re Komîteya giştî ya partiyê civiya, Qazî Mihemed wek serokomar hilbijartin. Qazî Mihemed jî di bin serokatiya Hecî Bab Şêx de hikumet ava kir. Hikumet jî 13 wezîran pêk dihat:

Serokê Hikumetê: Hecî Bab Şêx,
Wezîrê Berevanîyê: Mihemed Hûsên Seyfî Qazî,
Wezîrê Post û Têlgrîfê: Kerîm Ehmedî,
Wezîrê Çand: Menaf Kerîmî,
Wezîrê Karê Navxweyî: Mihemed Emîn Mueyînî,
Wezîrê Karê Derve û Şewîrê: Hecî Rehman Îlhazade,
Wezîrê Çûnûhatinê: Îsmail Îlhazade,
Wezîrê Aboriyê: Hecî Mistefa Dawidî,
Wezîrê Bezirganiyê: Ehmed Îlahîzade,
Wezîrê Çandiniyê: Mehmud Velîzade,
Wezîrê Xebatê: Xelîl Husrevî,
Wezîrê Propagandayê: Sidiq Heyderî,
Wezîrê Dadweriyê: Mele Husên Mecidî.
Wezîrê Tendûristiyê: Seyîd Mehmed Eyyubî.

Hikumeta Komarê, ala Kurdistanê ya ku di sala 1919an de li Stenbolê ji aliyê Komela Teşkilatî İctîmaiye ya Kurd ve hatibû qebûl kirin, pejirand.

Projeyên ku Hatîn Pêkanîn...
Komara Kurdistanê ya Mehabadê di temena xwe ya kurt de, karê gelek hêja pêk anî.

Di qada aborî û perwerdayiyê de, di demeka teng de gavên girîng avêtin. Zimanê kurdî, bû zimanê perwerdeyî.

Ji bona Komarê hêzên leşkerî yên nîzamî hatin avakirin.

Îstasyoneke radyoyê hate damezirandin.

Li Şînoyê, li Mehabadê, Bokanê, Saqîzê dibistan ava bûn.

Melewan êdî li mizgeftan bi kurdî waaz didan.

Wek peymaneke civakî makezagon amade bû. Makezagona Komara Kurdistanê, gorî demokrasiyê pêşketî û pîvanên Wilson û hêjayiyên Ewropayê hatibû amadekirin. Sekûlerizm û modernîteke demokratîk hatibû pejirandin. Ev yek ji bo civateke muhafezakar, edetî, îslamî gelek girîng bû. Di makezagonê de wekhevîya jin û mêran, mafên sendîqayî, azadiya fikrî, rêxistinî, baweriyê hatibû qebûl kirin.

Di Komara Kurdistanê de ji bona ku hûnera kurd, şanoya kurd, musîka kurd pêş bikeve xebatên girîng hatibûn kirin.

Hilweşandina Komarê û Mele Mistefa Barzanî...

Komara Kurdistanê ya Mehabadê, hemû erd û axa Kurdistanê nedigirt nav xwe. Hezar mixabin temena Komara Kurdistanê dirêj nebû. Komara Kurdistanê 11 mehan li ser piya ma. Piştî dewletên ku li ser axa Îranê desthilatdar bûn, di nav xwe de ji bona parvekirina dinyayê li ser peymaneke nû li hevûdu kirin. Yekîtiya Sowyetê xwe ji Îranê vekişand û piştgiya xwe ya bo Komara Kurdistanê û Ezerbeycanê qut kir.

Hikumeta merkezî ya Îranê êriş bir ser Komara Kurdistanê. Diyar bibû ku li hemberî êrişên dewleta kolonyalist û hêzên leşkerî, kurd nikarin rawestin. Di vê qonaxê de gengeşiya rewşa nû dest pê kir.

Mele Mistefa Barzanî, di sala 1943ê de li Başûrê Kurdistanê pêşengiya serhildaneke millî kiribû. Hezar mixabin ku di encama êrişên Îngilîz û Iraqê de şikest xwar û mecbur bû ku ew û hevalên xwe derbasî Rohhilat Kurdistanê bibin. Wek Mele Mistefa Barzanî bi xwe jî behs dike, li Rohhilata Kurdistanê dikevin bin xizmeta neteweya kurd.

Mele Mistefa Barzanî û hevalên wî jî di damezirandina Komara Kurdistanê de rolekî girîng lîstin, di bin serokatiya Komarê de wek xebatkar, leşker û serleşkeran kar kirin, tu caran pêşengiya xwe dernexistin pêş.

Mele Mistefa Barzanî ji bona ku rewşa dawî bi Pêşewayê Kurd re qise bike, di êvara 16. 12. 1946an de hevdîtineke dawî bi wî re pêkanî. Xwest ku bizane Pêşewayê kurd dê çi bike. Di vê hevdîtîne de Pêşawayê kurd Qazî Mihemed ji Barzanî re dibêje: "Ji bona ku zêde xwîn nerije, miletê min zerar nebîne, ezê xwe bidim destê dijmin." Di eynî hevdîtîne de diyar dike ku Barzanî bi xwe jî zerar nebîne û Îranê terk bike.

Mistefa Barzanî di heman hevdîtîne de emaneta xwe ya pîroz, Ala Kurdistanê ji Pêşewayê Kurd teslîm girt û piştî şerekî dijwar li hemberî Îranê, Tirkiyeyê, Iraqê derbasî Yekîtiya Sowyetê bû.

Dîlketina Serokên Komarê û Dadgehkirina Wan...

Komara Kurdistanê piştî êrişeke leşkerî ya dijwar hate rûxandin. Serokên wê jî, Qazî Mihemed, Seyfî Qazî û Sadrî Qazî di 20.12.1946an de ji aliyê dewleta Îranê ve hatin

girtin. Dîlgirtina wan, neteweya kurd ji qetlîama dewleta Îranê xelas nekir.

Qazî Mihemed Gandîyê Kurdistanê bû. Hezar Mixabin Îran ne Engilîstan bû...

Qazî Mihemed û serokên din yên Komara Kurdistanê di dadgehê de bi awayekî nehiqûqî hatin darizandin. Wan jî di dadgehê de neteweya kurd û Komara Kurdistanê bi cesareteke medenî û layiqî serokbûna xwe parastin. Hemû tawanên dadgehê red kirin. Li hemberî heqeretên qadiyên dadgeha Îranê rawestiyân.

Qazî Mihemed, mafê neteweya kurd, meşrûbûna Komara Kurdistanê ya Mehabadê, ala û surûda Kurdistanê gelek aşkere parast.

Parastiina Qazî Mihemed û têkoşerên din yên Komara Kurdistanê, li hemberî dijminên gelê kurd parastineke û helwesteke dîrokî bû.

Qazî Mihemed di dadgehê de gelek aşkere desthilatdarên Îranê tewanbar kirin û got:

"Ez di quncên girtîgehê de dengê xwe li dijî dewleta Tehran û serokên wê bilind dikim û dibêjim ku hûn gunehbar in, ne em. We welatê me dagir kiriyê. Tevahiya ev serpehatî û bûyeran encama siyaseta dagirker a dewletê ye. Ger dewlet hemû kurdan bi xayîn dizane, bila ji kurdan vegerin, kar û barên xwe bi xwe bigrin destê xwe. Ev bûyera di encamê de bûye ku we bi xwe makezagon binpêkiriyê. Niha jî ez tenê bi xwe demokrasiyê di Kurdistanê de xurt dikim û pêşve dibim û tu hêzeke biyanî haydarê min nebûye. Bêpar bûna gelê Kurd yê bûye haydarê min, ji bo birêvebirina van kar û xebatan e."

Pêşewa Qazî Mihemed di heman demê de Barzanîyan jî li hemberî dadgehê diparêze û dibêje:

"Mele Mistefa Barzanî kesekî biyanî nebû ku hatibû Kurdistanê. Kurdistan mala her kurdekî ye. Barzanî, ji bona ku şert û zurufan xwest, ji odeyê mala xwe derbasî odeyê din bû.... Ez bi çend rêzan Mele Mistefa ji we re bidim danasîn. Di dinyayê û dîrokê de kesên şexsiyetmezî û dûrbîn û leheng û bişeref û hûmanîst û azad û bêtîrs hene. Barzanî jî yek ji wan kesan e."

Bi vê parastina Qadî Mihemed jî derdikeve holê ku Komara Kurdistanê û ew bi xwe jî Kurdistanî bû. Beşbûna Kurdistanê û Barzanî jî ew qas xweş û objektîf tê terfî kirin.

Hezar mixabin piştî dadgeheke bêhiqûqî Qazî Mihemed, Seyfî Qazî û Sadrî Qazî bi lezûbez di 31. 3. 1947-an de li meydana Çarçiraya hatin daleqandin.

E n c a m ...

Ez dikarim bibêjim ku di dîroka neteweya Kurd û Kurdistanê de avabûna Dewleta Kurdistanê ya Mehabadê, gaveke girîng û stratejîk bû. Kurd di sedsala 20an de dibûn xwediyê dewleta xwe.

Ew dihat wê wateyê ku xebata serokê Kurdistanê Ubeydullah Nehrî, Simko Axa, Şêx Mehmud Berzencî, Şêx Ebdûselam Barzanî, Şêx Seîde Pîranê, Seyîd Rizoyê Dersîmê, îhsan Nûrî Paşa û hemû pêşengên din encameke dîrokî da bû.

Avabûna Dewleta Kurdistanê ya Mehabadê, li Kurdistanê û li Rohhilata Navîn şoreşeke bê çek bi rîya siyasî û rêxistinî û milî û demokratîk pêk hat.

Ew bi serê xwe şoreşeke dîrokî bû.

Esaserd; YNKê hevpariyêke rasteqîne dixwaze

Serjkirdeyê naskirî yê YNKê Ferîd Esaserd wiha got; YNKê hevpariyêke rasteqîne dixwaze. Endamê serkird-eyetiya Yekîtiya Nîştimanî ya Kurdistanê Ferîd Esaserd di daxuyaniyêke xwe de ragihand; Yekîtiya Nîştimanî ya Kurdistanê herdem hewil daye ji bo ku hikûmetêke hevbeş û tede YNKê hevparê rasteqîne be û xizmetêke baştir ji gelê kurd re were pêşkêş kirin.



Di daxuyaniya kenaleke televizyonî de, endamê serkirdetiya YNKê Ferîd Esaserd ragihand; YNKê dixwaze di Encûmena Wezîran û Parlemanê û di hemû cihên girîng de hevbeş û hevpareke rasteqîne be û pir girînge ku li wir nêrîneke yekbûyî hebe ji bo yekrêziya hemû aliyên kurdî ji bo tevahiya dosyayan.

Esaserd di dirêjahiya daxuyaniya xwe de, zelal kir ku dema ew li ser hevbeşî û karên hevpar di birêvebirina hikûmraniya hikûmeta Herêma Kurdistanê de dibêjin ku YNKê wê hem di hundirî Encûmena Wezîran û hem jî di parleanaê û hem jî li Bexdadê xwedî biryar û helwest be heya ji bo navçeyên ku hatine birîn jî. **PUKmedia**

Civîna navbera PDKê û aliyên siyasî ya pêkanîna hikûmetê destpê dike!

Biryare vê heftiyê civîna navbera PDKê û aliyên siyasî yên Kurdistanê bo pêkanîna kabîneya nû ya hikûmeta herêma Kurdistanê destpê bike. Endamê rêveberiya PDKê Nûrî Heme Elî ji BasNewsê re ragehand, vê heftiyê civîna dê bîn pêkbên. Lê amaje bi wê yekê jî kir ku diyar nîne dê çi rojekê de civîna birêve biçin.

Herwaha got, civîna şandeya PDKê dê li gel şandeyên YNKê û Gorran birêve biçê û pîrsa pêkanîna kabîneya nû ya hikûmeta herêma Kurdistanê dê bê guftû-go kirin. Vê derbarê de BasNewsê peywendî li gel berdevkê fermî yê YNKê Seîdî Ehmed Pîre pêkanî û Pîre ragehand, hîn diyar nîne gelo îro 19.01.2019ê civîna dê pêkbê yan na. Lê berî naha navborî ji BasNewsê re ragehandibû îro dê civîna destpê bike. **BasNews**

Efrîn - Piştî dagirkeriya 3 milyar dolar zirar guhaye aboriya herêmê

Pisporên aboriyê aşkere dikin jiber dagirkeriya Efrînê 3 milyar dolar zirar gihayê aboriya herêmê. Herwiha Tirkiyê û komên çekdar dest danibûn ser gelek kargehan û zeviyên zeytûnan ê Efrînê.



Aborîzan Çeleng Omer ji VOAYê re dibêje ku di nava çend salên borî de aboriya herêma Efrînê bi awayekî balkêş geş bû û gelê herêmê di rewşeke rind de dijîya.

